



BULTENA ÇANDINIYÊ

AKP nikare ji çareserîya pêdiviyên cotkaran re polîtîkayê pêş bixe!

- AKP'ê soz dabû ku sewalkarên sewalên xwe di bin baneyê Saziya Goşt Şîr (ESK) de serjêke, dê 2500 TL piştgiriyê bide wan. Lê 2 hefte şûnde derket holê ku tu encama vê projeyê tune ye. Li gel ku di sala 2019'an de di bin baneya ESK'ê de 1500-2000 sewal hatin serjêkirin jî, di 16 rojên meha gulana 2022'an de nêzî 500-550 sewal hatin serjêkirin.
- Midûriyeta Giştî ya Karê Çandiniyê (TÎGEM) di meha çile de buhayê dewarên dermale, zem kir. Lê piştî karkasê buhayê serjêkirinê zêde kir, TÎGEM'ê î di meha nîsanê de cara duyemîn buhayê dewarên dermale zêde kir. Herî dawî buhayê dermaleyan, di meha çilê de ji sedî 40 û 50'î zêde bû. TÎGEM'ê di meha nîsanê de bi zema duyemîn buhayê dermaleyan di navbera ji sedî 11 û 36'an de dîsa zem kir. Li gorî vê yekê buhayê noginên reşbelek ên 3-5 mehî bêyî buhayê KDV'ê buhayê wan ji 22 hezar û 200 TL'yan derketiye 26hezar û 640 TL'yî. Buhayê çêleka Jersey a 6-8 mehî ji 29 hezar û 700 TL'yî derket 32 hezar û 670 TL'yî. Buhayê çêleka Simental bêyî KDV ji 22 hezar û 300 TL'yan derket 26 hezar û 760 TL'yan.
- Li gorî Mudûriyeta Giştî ya Karê Çandineyê (TÎGEM) di sala 2022'an de buhayê bizin û mihên dermale aşkere kir. Li gorî lîsteya dawî ya buhayê mihan ku TÎGEM'ê aşkere kir, Buhayê Miha cînsê Merinosa Anadolu, 4200 TL, buhayê miha cînsê Ivesî 3600 TL, buhayê miha Bafra 5040 TL, buhayê cînsê Acipayam 3000 TL, buhayê miha cînsê Kivircik 5700 TL, buhayê Karaman a Xemrî 2820 TL, Buhayê cînsê Karamana boz ji sedî 3000 TL, Buhayê Merinosa Anadoluyê 4200 TL, buhayê cînsê Akkaraman a Kangal jî derket 4400 TL'yî.
- Buhayê maliyeta 1 kg genim, di meha çile de ji 2,5 TL'yan derket 4,5 TL'yî. Di meha gulanê de buhayê gubre û mazotê di asta jor de buha bû. Bi zemê re lêçûna 1 kg genim derket 6 TL'yî. .
- Endeksa buhayê hilberînên berhemên çandiniyê ya meha Nîsanê (Tarim-UFE) salana ji sedî 118,53 zêde bû. Mehane jî gihişt ji sedî 17,76 'yan.
- Li gorî bîlançoya sala 2021'ê ya Kooperatîfên Kredîya Çandiniyê, markayên di bin baneyê Kooperatîfa Krediyên Çandiniyê 249 milyar TL zerar dîtiye. Heta dawîya sala 2021'an, Marketên Kredîya Çandiniyê ku li tevahiya Tirkiyeyê 700 şaxên wê hene, ji ber ku buhayê berheme wê li gorî yên piyaseyê zêde ye, zerar kiriye.



- Çaykurê di encama xebatên 5 salên dawî de 2,6 milyar TL zarar kiriye. Di sala 2017'an de 268 milyon TL; di sala 2018'an de 657 milyon TL; di sala 2019'an de 635 milyon TL; di sala 2020'an de 547 milyon TL; di sala 2021'an de 504 milyon TL zarar kiriye.
- Li gorî kovara The Economist, Rûsya û Ukrayna, ji sedî 28'ê genim, ji sedî 29'ê ceh, ji sedî 15'ê garis, ji sedî 75 rûnê berberojan li tevahiya cîhanê temîn dike. Piştî Rusya kendava Odessa xist dorpêçê û îxracat asteng kir. Ev bû sedem ku li cîhanê qeyrana zexîreyan (xurekan) pêş bikve .
- Ofîsa Berhemên Axê (TMO), di sala 2021'an de buhayê genim 2250 TL diyar kir. Li gorî buhayê jêr ê genim ê ku TMO di sala 2021'an de diyar kiribû, çotkar bi buhayê 1 ton genim, 346 litre mazot dikirî. Li gorî ku TMO'ê di sala 2022'an de buhayê tona genim 7.500 TL diyar kir jî, dîsa bi tonek genim tenê 333 litre mazot tê kirin.
- Di navbera dîrokên 23-27'ê gulanê de Buhayê zikhev ê zad (hûbûbat) ê Borsaya Bazirganiyê wiha ye: Buhayê genimê nan: 6.043 TL/ton, Buhayê genimê maqarna: 6.650 TL/ton, Buhayê çeh: 5.961 TL/ton, Buhayê Garis: 5.990 TL/ton, Buhayê cewdera genimê: 5.265 TL/ton
- Di nava welatên G20'an de welatê ku enflasyona zexîre herî zêde ye, bi rêjeya ji sedî 70'yî Tirkiye ye.
- Li Zozanê Şênê yê Mûşê û herêma çoltarê çiyayê Cûdî û Gabarê yên Şirnexê ji ber şerê leşkerî bi sedan dar hatine birîn.
- Gundiyên ku li Gundê Zevkan ê navçeya Geverê bi sewalkariyê debara xwe dikin; ji ber qedexeyên zozanan êdî bi zor û zahmetî sewalan xwedî dikin.
- Li gorî daneyên îthalata gubre ya meha Adarê ya TUÛK'ê Tirkiyeyê bi giştî 209 hezar û 584 ton gubreyê ure îthal kiriye. Di îthalata gubreyê Ure de Umman bû yekemîn, Misir jî bû duyemîn.
- Li gorî daneyên bazirganiya devrve ya Adarê ya TUÛK'ê ji Ummanyê 131 hezar û 281 ton, ji Misirê 56 hezar û 166 ton, ji Turkmenîstanê 7 hezar û 57 ton, ji Rusyayê 6 hezar û 160 ton, ji Ozbekistanê 5 hezar û 605 ton, ji Azerbaycanê 1613 ton, Ji Emîriyên Yekbûyî yên Erebb 1000 ton û ji Îranê jî 438 ton, bi giştî 209 hezar û 584 ton gubre îthal kiriye.
- Li gorî Fîrmayan Rojane BUHAYÊ GUBREYÊ URE (30 Gulan)
 - ALP ATEŞ: 13500 TL/ton
 - GEMLÎK: 12300 TL/ton
 - GUBRETAŞ: 12600 TL/ton
 - TOROS: 12900 TL/ton
- Li gorî fîrmayan Buhayê Gubreyê CAN (30 Gulan)
 - BAGFAŞ: 6475 TL/ton
 - GEMLÎK: 6300 TL/ton
 - GUBRETAŞ: 7250 TL/ton
 - TOROS: 6600 TL/ton



- Li gorî Firmayan Rojane BUHAYÊ GUBREYÊ DAP'Ê (30 Gulan)
ALP ATEŞ: 14200 TL/ton
ETÎ: 13750 TL/ton
GUBRETAŞ: 12195 TL/ton
ÎGSAŞ: 13250 TL/ton
TOROS: 13850 TL/ton
- Li gorî firmayan rojane BUHAYÊ GUBREYÊ 20.20.0 (30 Gulan)
ETÎ: 9000 TL/ton
GEMLÎK: 9300 TL/ton
GUBRETAŞ: 7950 TL/Ton
ÎGSAŞ: 9100 TL/Ton
- Li gorî firmayan buhayê gubreyê 15.15.15 (30 Gulan)
GEMLÎK: 10650 TL/ton
ÎGSAŞ: 9650 TL/ton
TOROS: 9650 TL/ton

Hin berhemên çandiniyê yên bingehîn û rêjeya zêdebûna buhayê wan

<u>Berhem Kg</u>	<u>Buhayê zeviyê</u>	<u>Buhayê Hala Mêrsînê</u>	<u>Buhayê Hala Stenbolê</u>	<u>Buhayê serfkar</u>	<u>Buhayê serfkar ê meha borî</u>	<u>Buhayê Serfkar ê Salek berê</u>
<u>Îsot</u>	5-10 TL	7-23TL	6-30 TL	20-40 TL	15-50 TL	4-10 TL
<u>Fireng</u>	2-7 TL	4-16TL	5- 30 TL	16-40TL	30-50 TL	4-12 TL
<u>Kartol</u>	1-3 TL	2-6 TL	5-13 TL	10-24TL	5-25 TL	3-5 TL
<u>Pîvaza Hisk</u>	0,25-2 TL	2 -3 TL	3-5 TL	7-20 TL	3-15 TL	1-4 TL
<u>Bacana Reş</u>	3-5 TL	5-8 TL	8-15 TL	17-25 TL	15-45 TL	5-8 TL
<u>Sêv</u>	4- 8 TL	8-11 TL	10-18 TL	17-25 TL	12-25 TL	6-10 TL
<u>Purtegal</u>	1- 5 TL	2-5 TL	3-15 TL	11-15 TL	9-20TL	3-8 TL
<u>Hirmî</u>	1-3 TL	3-5 TL	5- 25 TL	20-35 TL	15-30 TL	5-12 TL

Nîse: Buhayên berhemên li gorî malîyeta zêde û kalîteya berhemên tê guhertin.

